

Sahmeran



SARA

SAHMERAN



ŞAHMERAN

- Ji zencîra çîrokên gelêrî yên kurdî - 1

Berhevkar: Bavê Barzan

Wêne: Fernando Donaire

Weşanên SARA'yê

Dalagatan 42

S-113 24 Stockholm - SWEDEN

Tel/ fax: +46 / +8 - 331 229

Weşanên SARA'yê

ISBN 91 87662-45-0

Pêşkêş e ji hêviyên pêşerojê, ji zaro û xortêñ me re,

û ji Brahîm'ê biçûk re...

ŞAHMERAN

Hebû ne bû, li şaristaneke rohelatê mirovekî bi navê Ziriyal hebû. Ew mirovekî jîr, hekîm û şareza, zaniyarekî mazin ê dema xwe bû. Wî jin û kurek hebûn. Navê kurî Camîsab bû.

Pirtûkeka Ziriyalî ya bi navê Xwezaya Cîhanê hebû. Wî di vê pirtûka xwe de, li ser hebûna bajarê binerdî yê maran nivîsîbû. Marên ku ji ber zordariya mirovan xwe li bin erdê veşartibûn... Wî digot pêdivî ye, ku mirov rêza hemû

zinduyan bigirin û zinduyek li ser zinduyekî din zorkariyê ne ke. Lê roja ku dem hat, wî serî danî, ji dunyayê bar kir. Hingê kurê wî Camîsab, tenê di gel dayika xwe ya pîr ma.

Piştî mirina bavî, rewşa wan a malê pir î neçê bû. Her ku diçû, hejar dibûn. Diviya ku kurê pîrê Camîsab, her roj biçûya li der û deverna, êzingan, dar û depina bida hev, bihaniya li bajêr bifirota. Çu karekî din ji destê wî ne dihat. Xwandina xwe jî ne biribû serî. Bavî, berî mirinê, gelek caran jê xwastibû, da ku ew xwandina xwe hewke. Lê wî xwandin di nîvî de hiştibû. Carinan ji xwe re, pirtûka bavê xwe ya ku jê re mîrat mabû, li malê dixwand. Di pirtükê de bavê wî digot; "marên ku ji ber stema mirovan reviyane û xwe kirine bin erdê, şahbanûyeka wan a ciwan û bedew heye, ku navê wê Şahmeran e. Ev şahbanû, wisan xwedî ciwaniyek e, ku nayête pesindayin." Dema Camîsabî van gotinên li ser bedewiya Şahmeranê dixwandin, di dilê xwe de hezkirineke mazin jê re xwedî dikir.

Camîsab piraniya caran derdikete çolê li welatê Şahmeranê digeriya. Digot; dibe ku ez rastî gencîneyeke binerdî jî bihêm û pê dewle-mend bim. Lê bêkêr bû. Ne rastî welatê Şah-meranê û ne jî rastî gencîneyeke binerdî dihat.

Rojên Camîsabî, bi tevayî, bi berhevdana qal û qırşan derbas dibû. Wî dar û depên ku dicivandin hev, li ser pişta kerê suwar dikirin, ew dihanîn, li bazarê difirotin. Bi pereyên wan, xwarin dikirî, paşê serrast vedigeriya malê nik dayika xwe ya pîr. Wan şîva xwe bi hev re dixwar û dema razanê jî Camîsab diket nav cih û nivînên xwe û radiza. Serê beyaniyan, dîsan zû radibû û diçû çolê ji bo berhevdana qal û qırşan. Jiyana wî her wisan derbas dibû.

Padîşahê dewranê zordariyeke bê hempa li ser şeniyê welêt dikir. Ji gelî bac û zikatêن giran û mazin werdigirtin. Gel ji ber vî barî, ketibû nav rewşeke dijwar. Giranî û buhabûn destpêkiribû û gel ji birçîbûnê dimir.



DARIRE

Camisab, ézingan dida hev, dihan cw li bajér difirotin.

Gelî xwe kir yek û li hevberî vî padîşahê stemkar serî rakir. Gelî dixwest ku padîşah ji ser textê werkin.

Li qesrê, padîşah tev li wezîrên xwe, li dîwanê rûniştibû. Wezîrên wî jê re digotin:

— Stêrnasên me dibêjin, ku li welatê me pîremerekî zane hebû, ku navê wî Ziriyal bû. Wî pirtûkek heye ku têde li ser raperîn û serbestiya gelî nivisiye. Ta vî pîrê zamanî dibêje, ku mirov li hevberî padîşahê me xwe bikin yek û ji xwe re azadiyê peydakin. Divêt em vê pirtûka wî, berî ku bikeve nav gelî bi destxin. Ziriyal neha miriye û pirtûk ji kurê wî re, yê bi navê Camîsab, mîrat maye.

Padîşah piştî guhdariya van gotinên wezîran kir, ferman da ku zû herin Camîsabî bigirin û xwe bigehînine pirtûkê.

BÎRA HINCIVÊ

Rojekê Camîsab derketibû çolê, ku wî ji xwe re êzingan bida hev dîsan. Li nav rîl û darista-

nan, li pêş şikeft û hevingan, li devî û deveran, ji xwe re digeriya û dar û êzing, dikirine ser pişa kerê xwe.

Camîsab wê rojê pir westiyabû. Dunya germ bû û wî xwe li ber siya deriyê şikeftek dirêj kiribû, ku bêhna xwe vede. Dît ku va ye li ber deriyê şikeftê tiştek gilover dixuye. Ev tişte glover mîna bîrek e. Di ser de jî bîr, ta keviya kevirên jora xwe, tijî av bû! Bîr, di vê çola hişk û zuwa de... bîra avê? Ma ev dibû? Ji lewre pêşiyê bi çavêن xwe bawer ne kiribû. Lê dema bi berdewamî dît, ku va ye bi rastî jî bîrek li ber çavêن wî rawestiyayî ye, hingê hêdîkan xwe nêzîkê bîrê kir. Hat li tenîsta bîrê çok da erdê û ji nêzîk ve lê temaşa kir. Dît ku bîr ta ber kefa devê kevirên jorê, tijî tiştekî rohn û şilo ye. Lê ev tişte sor ê di navê de, ne av bû! Dema Camîsabî hêdîkan tiliyeka xwe têre kir û piçek ji wî tişte rohn û şilo bîhn kir û çîkek jî li ser zimanê xwe danî û çej kir, têgehişt, ku ew ji bilî hingivê ne tiştekî din e. Lê wî dîsan bi çavêن xwe bawer ne kiribû. Ta ji wî hat



Camisab ji hingiva bîrê çêj dike.

ji hingiva bîrê xwar, zikê xwe bi hingiv dagirt. Hingiveka welê xweş, di jiyana xwe de ne xwaribû. Dema wî têr xwar, rabû ser xwe û hingê bawerî bi vî tiştî hanî. Bi vê bîra hingivê gelek dilxweş bû. Ji dilxweşiyê dikir bifiriya. Digot; ez ê herime meşkna ji malê bihênim û bi kerê hingivê bikêşim malê û ji wir jî bibime bazarê û bifiroşim. Ez çendîn hingiv ji bîrê kêmkim, ê dîsan ew çend were şûnê. Ev bîr, bîra hingivê ye! Hoy hoy! Ez ê pê xweşpergal û dewlemend bim!

Paşê pirtûka bavê wî hat bîra wî. Bavî di wê pirtükê de çêl û behsa wê riya nependiya ku diçû welatê binerdî dikir û digot ku "ew rê ji binê bîrek diçe." Lê Camîsab ji ber dilxweşiya xwe ya li ser bîra hingivê, neha li ser vî tiştî pir hizir ne dikir.

Bi vê dilxweşî û germiyê, berê kerê da ber bi gundî ve û bi rê ket, vege riya malê. Wî bi lez û bez çend meşk û satil li malê hebûn, dane hev. Pişt re berê xwe da mala hevalek. Pir bawerî

bi vî hevalê xwe dikir. Ji lewra bû ku wî xwast ew jê re alîkariyê bike. Camîsabî hevalê xwe têgihand ku divêt ew bi hev re herine ciyek. Camîsabî zanî bû ku hevalê wî dê ji kesî re çela bîra hingivê ne kira. Heger bikira jî, her kes ê pê bikeniya. Ma bîr û hingiv! Kes ê jê bawer ne kira. Hevalê xwe da pey xwe, ji malê derketin berê xwe dan ser riya ku diçû bîrê.

ŞARIŞTANA MARAN

Her ku diçû, hingiva bîrê kêm dibû. Ji lew re wan çendîn hingiv dibirin û li bazarê difirotin, ew çend jî, ji hingiva bîrê kêm dibû. Ne weku Camîsabî hêvî dikir, ku şûn dihate dagirtin. Camîsab û hevalê xwe pir ber bi nemana hingivê ve diketin. Lê bêkêr bû. Hingiva bîrê hemahema ne mabû.

Rojekê tenê bi çendî meşkekê hingiv di binê bîrê de mabû. Hevalê Camîsabî gote wî:



Camisab ú hevalê xwc, ji hingjva birê dibirin ú li bazarê difirotin

– Dakeve jêrê û hingiva mayî jî bike vê
meşkê û paşê ez ê te bikêşim jorê û em ê herin
pereyên hingivê, ku me ta neha firotine, li hev
par bikin.

Beyî ku hizireke neçê were dilê Camîsabî, wî
xwe bi werîsî ve, berda jêrê bîrê. Hingiva mayî
jî kire meşkê û hevalê wî meşka hingivê zûka
kişande jorê. Paşê jî wî werîsê ku dê pê Ca-
mîsab bikişanda jorê, avête nav bîrê û berê
xwe da ber bi gundî, çû malê.

Ew hevalê ku Camîsabî ew çend baweriya
xwe pê dihanî, vê bêbextiyê bi wî dikir.
Camîsab hêvîşikestî û neçar di bînê bîrê de bi
tenê mabû.

Di binê bîra tarî de, Camîsabî dît ku va ye,
ji nav terkên kevirên dîwarê bîrê, ronahiye
ber bi çavê wî ket. Ev ronahî kuneğî bi çendî
serê derziyê mazin bû. Wî doxa heska destê
xwe kire binê kevirî û ji cih derhanî. Bi tiliyên
xwe ew kunê ku jê ronahî dihate der, kola,
mazin kir. Lê tiliya wî li tiştekî hişk ket. Wî ji

ber miraqan zû bi zû û bêhtir dest bi kolanê kir. Piştî demekê, dît ku va ye tehtekte pehn î mîna deriyekî girtî derkete meydanê. Ronahiyek ji navbera terka du keviran li rû û çavên wî ket. Bi deriyê kevir ve, çemilek jî hebû. Camîsab dîsan bi vê dîtinê bawer ne dikir. Ev ci bîr bû ku pêsiyê têde hingiv derdiket û neha jî di binî de deriyek bi çemil xuya bûbû. Destê xwe da çemilê ku derî veke, li ber derî rûnişt û li ser vî tiştê ecêb û seyr piçek hizir kir. Wî paşê hêdîka destên xwe da çemilî, derî ber bi xwe ve kişand û vekir. Lê çi bibîne? Dît ku va ye li hêla din, hema pêngavek li ber lingê wî û pêş de, dunyake nuh vezelandî ye. Bi vê dîmena ji nav derî, qesr û konaxeke xweşik î bêhempa û bênimûne, bi hewz û baxçe û dar û hêşinayî li ber çavê wî ye. Devê wî li ber ciwaniya vê dîmenê ji hev ma. Demeke dirêj wisan bêdeng û bi heyranî temâseya vê dîmenê kir. Hêdîka pêngavêن xwe ji derî havêtin hundirî û kete nav baxçê. Çû li kenarê hewza avê li ser textebendek rûnişt. Wî di dilê xwe de got xwezi ev bax û bostana han

ya min bûya û ez ta dawiya jiyana xwe têde bûma. Ji ber rindî û ciwaniya baxçê, ji xwe de çû û li ciyê xwe vezeliya, ket xeweke kûr û dirêj.

Li civata şahbanûya maran, bêdengiyek hebû. Ew roja ku şeniyê bajarê binerdî jê ditirsiyan, va ye hatibû. Ji lewra ademîzad ji bîra hingivê ketibûn hundir û êdî mirov, ji wê riya nependî daketibûn jêr û bi war û şargeha Şahmeranê hayidar bûbûn. Ev ne tiştekî baş bû. Wezîrê Şahmeranê got:

— Fermanbera rêzdar, heger we destûr hebe, em herin wî ademîzadê bêrêz û pir quşûr bigirin û serî li wî bifirînin. Çavê wan li vê dewlemendiya me ye. Ademîzad dixwazin me talankin. Çu tiştek nikare xwe li ber hêrs û xwesteka wan ragire. Çavê wan çi car têr nabe. Wan şîrê xav vexwariye û ew gelek çavbirçî ne. Bawerî bi wan nabe.

Şahmeranê li ser van gotinêñ wezîrî hizirek kir û bi carekê li civata xwe welê vegerand:



Pêngavek li ber lingê wi û pêş dc, dunyake nuh vezclandi bû.

– Ma di navbera me û ademîzadan de, kîjan cudahî, cudahiya herî girîng e? Ma ne dilpakiya me maran e, ku em kirine mar û em ji ademîzadan cuda kirine? Ez dibêjim ku em derfeteke din ya dilpakiya suruştâ serteserî bidine ademîzadan, dibe ku ew vê carê riya rast bibînin. Nexwe divêt rojekê em bihêne nik hevdû. Em nikarin ta serteseriyê xwe li vê derê veşerin. Paşê ev ê ji riya bîrê daketiyyê jêr, hatiye nik me, dibe ku kurê Ziriyalî, Camîsab bi xwe be. Ji lew re padîşahê demê li dû bi destxistina wê pirtûka bavê wî ye. Li pirtûkê zaniyarê mazin Ziriyal çêl û behsa jiyanâ me ya binerdî dike. Dibêje ku mafê maran jî heye li ser ruyê erdê, li tenîsta mirovan bi aştiyê bijîn. Lê ew neha miriye û hebe ne be kurê wî, bi alîkariya pirtûkê, riya me ya bi bîra hingivê veşartî dîtiye. Ziriyal dostê me bû. Na, wî ne kujin. Herin wî bihênenik min û bila bibe mîvanê min. Dibe ku ew, li pêşerojê bibe sedema aştiya mar û ademîzadan.

•••

MÊVANÊ ŞAHMERANÊ

Dema wezîrê Şahmeranê bi du alîkarêن xwe li ser serê Camîsab rawestiyân, ew ji xewa xwe ya kûr û xweş veciniqî û rabû ser xwe. Wezîrî bi dengekî bilind û bi zimanê wî jê re got:

– Hey ademîzad! Rabe ser xwe û bi me re were! Tu îro mîvanê şahbanûya maran, Şahmeran î.

Camîsabî, di jiyana xwe de, hebûnên, welê ku dipeyivîn ne dîtibû. Hem jî ev marêن han bi zimanê wî dipeyivîn. Ji piştê berjor mirov û ji piştê berjêr jî mar bûn. Tirseke mazin laşê wî vegirt û berê xwe da aliyê deriyê bîra hingivê, ku jê hatibû hundirê vî ciyê seyr û ecêb. Lê derî ne li ciyê xwe bû. Camîsabî dîsan berê xwe da wan her sê maran, dûr û dirêj li laş û serêن wan temâşe kir. Çu helwêsteka wan a dij-minahiyê ne dixuya. Tenê li ciyê xwe rawestiyabûn û hatina Camîsab dipan. Dema ew têgehiştin ku Camîsab jî, li ciyê xwe matmayî li wan temâşe dike, hingê jê re gotin:

- Li pey me were! Û pişta xwe dan Camîsab û bi rê ketin çûn. Camîsab hê jî matmayî li ciyê xwe rawestayî mabû.

Piştî demekê, hişê Camîsabî dîsan hate serê wî. Ew her sê mar jê dûr ketibûn. Ew vê carê têgehişt, ku bi rastî jî mar naxwazin çu ne-yariyek lê bikin. Wî hêdî hêdî pêngavêñ xwe li pey maran havêtin û bi rê ket.

Camîsabî li dû her du maran, pir çûn hindik çûn hatin li ber qesrek rawestan. Mar xwe dan alî û rê dan mîvanî, da ku ew berî wan têkeve hundurî. Camîsabî kete nav heywana mazin û pirnexşîn a qesrê. Ji dûr ve nîvmar û nîv-mirovek li ser textekî zêrîn rûniştî, rûbiken li bendî nêzîkbûna Camîsabî bû. Camîsabî ji ber vê yekê heyirtir mabû. Çimku ew marê li ser textê, ji hemû marêñ din cudatir, xwedî serekî ciwan yê mirovî bû. Laşê wê, laşê maran û serê wê serê mirovan bû. Serê keçeka bedew... Ev şahbanûya maran Şahmeran, desthilatdara bajarê binerdî bi xwe bû. Gava Camîsabî xwe nêzîkê wê kir, wê got:

– Ser seran û ser çavan hatî hey Camîsab.

Camîsabî bi seyr û heyreteke mazin welê
pirsi:

– Şahbanûya rêzdar, gelo hûn navê min
çawan dizanin?

Şahmeranê li ser vê pirsa Camîsab welê got:

– Dema min nûçeya pirtûka bavê te bihîst, ez
gelek pê dilxwes bûm. Hêviya min a derketina
ser ruyê erdê xurttir bû. Tiştê ku bavê te ji bo
me û ji bo mirovan kiriye, karekî hêja ye. Min
gelek li ser vî karê bavê te hizir kir. Her wisan
jî min bi navê te, kurê Ziriyâlî, navê Camîsabî
bihîst. Paşê jî, min tu di xewna xwe de dîtiye.
Ji wê rojê ve ye ku ez her dem hizira te dikim.

Camîsabî bi guhên xwe bawer ne dikir. Hêj
nuh giringiya wê pirtûka bavê xwe ya ku her
car li nav toza refa dîwêr mabû têdigehîst.
Bavê wî kêm pesna şahbanûya maran Şahme-
ranê dabû. Şahmerana li pêş çavan hêj ciwantir

bû. Wî dema pirtûka bavê xwe xwandinbû, pesnên bavê wî yên li ser ciwaniya ruyê Şahmeranê dil ji Camîsabî biribû. Êdî wî çu tirs di dil de ne mabû. Li ber bedewiya ruyê Şahmeranê ji xwe de çûbû. Agirê evîna dilê wî xurttir pêketibû.

Weku me bihîst, Camîsab û Şahmeranê ji dûr ve hay ji hev bûne û bêyî ku hev bibînin hez ji hev kirine. Tişte ku bavê Camîsabî di pirtûka xwe de nivîsibû, hezkirin û evîniya li ser xwezayê bû. Ew tişt bû ku dilê Camîsabî bi dilê Şahmeranê û yê Şahmeranê jî bi yê Camîsabî ve girê dabû. Ev dibû destpêka evîndariyeke germ û helez.

Camîsab ji jiyana xwe ya nuh pir dilxwes bû. Çu xwesteka wî ya din ne bû. Ji lewra ew her roj bi Şahmeranê re bû, ji xwe re kêf û henek dikirin.

Rojekê wezîr û civata Şahmeranê li dîwanê rûniştibûn. Bêdengiyek daketibû ser civatê. Dengê Şahmeranê vê bêdengiyê birri. Wê got:



Lage we mar, şere we şere mirovan bu. şere keçke ciwan.

DONATE

– Gelî wezîrêñ min ên hêja û civata min! Weke we bihîstî, min dil heye ku di gel Camîsabê ademîzad, xwe cotkim. Ez dizanim ku ev ne tiştekî, welê hêsan e û ev derveyî adet û toreyên me ye. Lê belê dilê min yekî din naxwaze. Heger we ta îro hinek bawerî bi şahbanûya xwe hanî be, hûn ê ji min bawerkin, ku ev gotina min ji bilî rastiyê ne tiştekî din e.

Wezîrê mazin piştî di gel çend wezîran da û stand, bersiva Şahmeranê welê da:

– Heger şahbanûya me destûrê bide me, em ê piştî sê rojan bersiva vê pirsê bidin. Ji lewra heger marêñ mazin ên li serê çiyê, vê bibihîsin, ew ê dunya tev serûbinkin. Kevir li ser kevirî nahêlin.

Şahmeranê serê xwe hejand û got :

– Herê, destûr ya we ye, fermo!

Sê roj derbas bûbûn. Şahmeran û Camîsab bi ahkêşîyeke kûr û mazin, li hêviya bersiva

civata wezîran bûn. Wezîrên Şahmeranê sê roj û sê şev li ser vê pirsê hizir kiribûn û ji hev pirsîbûn; gelo cotbûna mar û ademîzadan çawan dibû? Ev tiştekî li derveyî civata wan bû. Ta derveyî qanûnên xwezayî jî bû.

Sê roj derbas bûn. Wezîrên Şahmeranê hilkişyan ser dîwanê, li ciyê xwe rûniştin. Wezîrê mazin dest bi axiftinê kir û got:

— Me sê merc hene. Heger ku kurê ademîzadî Camîsab, bikaribe bersiva pirsên me bide, bila Şahbanûya me xwe pê re cot ke. Heger na, hingê ev yekbûna han, ne bi dilê şeniyê welatê maran e.

Şahmeran û Camîsabî li hev nihêrtin, lê çi derfeta wan a axiftinê tune bû. Wezîr nûnerê civatê bûn. Biryara wan, biryara civatê bû. Şahmeranê dîsan peyivî:

— Belê wezîrê min, fermo em li bendî bihîstina mercên we ne.

Wezîrî got:

– Mercê yekê, ev e ku divêt Camîsab ji me re
çêla jiyan û mirinê bike.

Yê duwê, li gor bîr û baweriya Camîsabî, ci
ye ku dikare cîhanê bi hêza xwe bigerîne?

Yê siyê jî ev e, ku heger kurê ademîzad
Camîsab, xwe bi Şahmeranê re cotke, divêt
hingê ew ta dawiya jiyana xwe, her li vî welatî
bimîne û venegere ser ruyê erdê. Gelo Camî-
sab ê bikaribe li ber ew bêrîkirina mazin a
welatê xwe raweste, sond û peymanê bide, da
ku ew êdî vî welatî li cih ne hêle û neçe?

Camîsab mîna ku di xewna şevan de be, bêyî
ku bi guh û çavêن xwe bawer ke, temşa vê
bûyerê dikir. Ji wê roja ku pirtûka bavê xwe
xwandibû, ji hingê ve dilê wî ketibû Şahmera-
nê. Lê Şahmeran nîvmar û nîvmirovek bû. Ma
cotbûna wî û Şahmeranê dê çawan bûya?
Camîsabî berî ku bersiva vê pirsê bida, diviya
bersiva pirsên wezîrê mazin bida. Wî ji

Şahmeranê destûr xwast û welê got:

- Li ser pirsa yekê ez dibêjim jiyan tiştekî welê ye, ku ta roja îro çu zinduyek haydarê vê sirê ne bûye. Lê belê divêt ku her zinduyekî bêyî kemasiyek xwedî mafê jiyanê be. Di navbera zinduyan de, serbestî, wekhevî û birayetî hîmê herî besdar be. Di jiyana hemû zinduyan de, ev tişt herî girîng û bingehîn e. Ev xweşî divêt bibe para her zinduyekî.

Li ser mirinê jî dibêjim ku divêt her zinduyekî, bizanibe ku rojekê ew ê her bimire. Mirin jî weke jiyanê sirekî welê ye, ku ta roja îro çu zinduyek hay li sirê ne bûye. Mirin û jiyan destbirakê hev in.

Ji bo pirsa duwê jî ez xwedî vê baweriyê me, ku tiştê cîhanê li ser hêza xwe digerîne, evîna li nav dilê jiyanê bi xwe ye. Jiyan bêyî evîn, evîn jî bêyî jiyan nabe.

Li ser pirsa dawiyê jî ez dibêjim; 'herê'. Heger Şahbanûya rêzbilind min bixwaze, min

ew bi dilxweşî û serbilindî divêt û ez ê ta dawiya jiyana xwe, bi dilxweşîyeke mazin li nik wê bim û li welatê wê bimênim.

Civata wezîran hemû li hev nihêrtin. Wan digot qey Camîsab mirovekî nezan e. Wan hêviya van bersivêñ xweş, ji wî ne dipan. Şahmeranê jî, ji ber van bersivêñ Camîsabî, ji xwe de çûbû. Wisan diyar bû ku wê jî, ji wê roja pêşî ku nûçeya pirtûka Ziriyalî û kurê wî Camîsabî bihîstibû, hêvidar bûbû, da ku rojekê ji rojan, Camîsabî bibîne. Û dewrana felekê jî ew bi vî rengî gihadibûn hev, va ye ser de jî dibûn cot.

CAMÎSAB BÊRIYA MALÊ DIKE

Çardeh sal derbas bûbûn, ku Camîsab û Şahmeranê jiyana xwe kiribûn yek. Her roja ku diçû jî, Camîsab bêhtir bêriya jiyana xwe ya ser rûyê erdê û bêriya dayika xwe dikir. Gelo hêj diya wî ya pîr dijiya, yan na? Dixwast



Dilê Camisabi di cih de ketibû qahmeranê.

DONZIRE

bizanibe. Ew bi jiyanâ xwe ya bi Şahmeranê re gelek dilxweş bû, lê welatê wî, dayika wî her dem li bîra wî bûn. Gelek caran Şahmeranê vê rewşê têdigehîst, lê ne dixwast ku birîna Camîsabî kûrtir ke. Xwe radigirt, jê re çu tiştek li ser vê yekê ne digot. Dem derbas dibû, kula dilê Camîsab jî her dijwartir dibû. Ne Camîsabî û ne jî Şahmeranê, dikaribûn vê rastiyê di dilan de veşîrin.

Rojekê Camîsabî ji Şahmeranê re mijara dilê xwe vekir. Gote wê:

– Ciwana min, weku tu jî lê varqiliyî ev demek e, ku ez bêriya malê, bêriya dayika xwe dikim. Her wisan jî ahkêşıya rewşa civata xwe dikim. Gelo dayika min sax e yan na? Gelo rewşa gelê min çawan e? Ez dixwazim ji van pirsan re bersivê peydakim. Ji ber vê yekê ez hêvîdar im ku tu destûrê bidî min, da ez bikaribim vejerim. Ez hez ji te dikim û bila soz û peyman be ku ez ê çi nepakiyek ne gehînime te.

Ji ber van gotinê Camîsabî, Şahmeranê kire
girî û got:

– Ciwanê min, tu baş dizanî, ku ez jî hez ji te
dikim û gotineka te nakim dudo. Ez jî dibînim
ku dilê te bi evîniya dayikê û welatî ve dişewite
û min navê ku tu bêhtir bi vê kulê birîndar bî.
Her wisan jî ez bawer im, ku tu çu nebaşiyek
nagehînî min. Fermo destûr ya te ye. Heger
dixwazî here. Ez ê nûçeya çûna te ne gehînime
çi kesekî. Lê çi caran min ji bîr ne ke. Dema
derkevî ser ruyê erdê jî, li xwe pir agehdar be.
Laşê xwe nîşa çu kesî ne de. Ji ber ku kesê ez
dîtibim û li welatê min mabe, li ser ruyê erdê,
laşê wî dibe xalxalî. Ev nîşana vî tiştî ye, ku
ew kes, bi riya nependî ya ku tête welatê
binerdî dizane.

DI ZINADANA PADİŞAHÎ DE

Camîsab li malê bi dayika xwe re rûniştibû û
wî li ser Şahmeranê û jiyana xwe ya binerdî

hizir dikir. Ji mêt ve vegeriyabû malê. Veger ji welatê binerdî ne dibû, lê Şahmeranê ewçend jê hez dikir, destûra wî bi dizî ve dabûyê û ew bêyî agehdariya civatê, ji welatê binerdî derxistibû û ew şandibû malê.

Heval û hogirên wî yên berê li dora wî rûniştibûn û bi hatina wî dilxweş bûn. Camî-sabî ji wan re çela civata maran dikir û digot :

– Pir tişt hene ku divêt em ji maran fêrbin. Belê ew mar in lê ew jî weke me xwedî dil û can in. Nîvê laşê wan jî mirov e, serê wan serê mirovan e. Heger em dijminatiyê bi wan ne kin ew têkiliya me nakin. Weku ez neha pê agehadar im, padîşahê me stem û zorkariyê li ser gelî bêhtir û dijwartir kiriye. Lê em bawer in ku ev jê re namîne. Xwedê sûcê wî jê re welê nahêle. Da em yek bin û pêkve vî padîşahî ji ser textê werkin.

Padîşahê dewranê pîr bûbû û jê re nexwesiyeck peyda bûbû. Bijîşk û hekîman digotin ku xwîna şahbanûya maran Şahmeran, dermanê

derdê wî ye. Stêrnasên padîşahî jî digotin, ku yên ji riya nependî daketine welatê maran û nêzîkê Şahmeranê bûne, laşê wan xalxalî ye. Ji nav ademîzadan ta neha mirovek tenê, bi vê riya nependî dizane. Ew mirov çûye wî welatî û vegeriyaye ser ruyê erdê. Padîşahî ferman da leşkeran, ku hemû serşoyên (hemamên) bajêr li şeniyê vekin û kî bixwaze bila here belaş û bêpere serê xwe bişo. Û yên xwedî laşen xalxalî ne, bigirin û yekser bihênine dîwana wî.

Piştî çend rojan pirsîn kî maye, kî ne maye ku ne çûye serşoyê û serê xwe ne şûştiye. Gotin lawê pîrê Camîsab maye. Pir ne hajot ku çar leşkerên padîşahî li ber mala wî peyda bûn. Destêن wî li kelemçê xistin û yekser ew birin dîwana padîşahî. Ji lewra ta wê rojê, çu mirovên xwedî laşen xalxalî ne girtibûn. Cil ji wî kirin, dîtin ku laşê wî tev xalxalî ye.

Padîşahî bi dilxweşî û bi bêhna fireh ji
Camîsabî re got;

– Tu bi xêr û xweşî hatî hey Camîsabê kurê zaneyê mazin Ziriyal. Ev çend salên dirêj bûn ku ez li benda hatina te bûm. Ez hêvidar im ku tu bêyî berxwe bidî, ciyê Şahmeranê ji min re aşkere bikî. Lê Camîsabî gote wî:

– Heger hûn serê min jî bifirînin, dîsan ez ciyê Şahmeranê nîşa çu kesekî nadim.

Li ser fermaña padîşahî, leşkeran ew havêtin zindeneke kûr û tarî. Heft salên wî di zindanê de derbas bûn. Her roj lêdan û şikence lê dikirin, da ku ciyê Şahmeranê ji wan re aşke-reke. Lê wî her ber xwe dida û ne dixwast bê-bextiyê li Şahmeranê bike.

Keça padîşahî li ber vê dilsojiyê ji Camîsabî re hezkirineke mazin di dilê xwe de xwedî dikir. Wê ji xwe re digot ev mirovekî dilsoz e. Xwezî min jî yarek wekî wî heba. Şahbanûyê xwe bi dizî ve digihande zindanê û ji Camîsabî re xwarin û vexwarin dibirin û birînêñ wî derman dikirin. Camîsab jî bi van kirinêñ şahbanûya taze pir dilxweş û spasdar dibû. Roj bi

roj dostaniya navbera wan, xweşir dibû. Rojekê êdî şahbanûyê bi halîkariya çend leşkeran bi dizî ve ew ji zindanê azad kir.

Camîsabî di cih de xwe gihande hevalên xwe û di gel hogiran hêrişek birine ser qesra padîşahî, ku wî ji ser textê bêxine xwarê. Lê ev hewildana wan bi ser ne ket û Camîsab vêca tev li hevalên xwe hat girtin û padîşahî tev li hogiran wan havêt zindana reş û tarî.

Her ku diçû birînên padîşahî dijwartir dibûn. Camîsab jî li ber ew lêdan û şikenceyan ne-xweşir û perîşantir bûbû. Lê dîsan jî, wî hêj ci bêbextiyek ne dihanî bîra xwe.

Wezîrên padîşahî kom bûbûn da ku çareyek ji vê rewşê re bibînin. Yekî ji wan gote padîşahî:

– Heger em Camîsab bitirsînin û bêjine wî, 'xwîna te jî dermanê birîna padîşahî ye', hingê dibe ku ew ciyê Şahmeranê bêje me. 'Ji lew re yên ku çav bi Şahmeranê ketine û çûne welatê

wê, xwedî laşekî xalxalî ne. Ji ber hindê xwîna wan jî dermanê derdê padîşahî ye. Em ê te gorî padîşahî kin!' Hingê dibe ku bitirse û dev ji vê cira xwe ya berxwedanê berde û riya welatê maran nîşa me bike.

Padîşahî ev pêşniyar pejirand û du serbirên wî vê fermanê ji Camîsabî re xwandin û ew hanîn ji bo serbirînê. Destêن wî girê dan ku serê wî bi lêdana şûrek bifirînin.

Weku dibêjin can şêrîn e. Camîsabî jî hingê ber bi canê xwe ket, serê xwe hêjand da ku destêن wî vekin. Wî dê Şahmeran çawan bi dest keta, ji wan re bigota.

DAWIYA ŞAHMERANÊ

Wê rojê Şahmeran pir xemgîn û dilşewat li heywana qesra xwe diçû û dihat. Ji kûrahiya dilê wê, dengek jê re digot; 'çi caran, bawerî bi ademîzadê şîrxwûr nabe.' Wê jî baweriya xwe



Şahmcran, şahbanuya maran, deştilatdara bajarê binerdi.

bi vî dengî hanî. Lê derengî bû. Ew xewn û merema dilê wê bi cih ne hatibûn. Ew ê çi caran ne derketa ser ruyê erdê. Hêj çi biratiyek di navbera zinduyan de ne dixuya. Ademîzad bi xwe dijminê hev bûn. Ma ew ê çawan hez ji maran bikirana?

Beyaniyekê zû stêrnasên Padîşahî dest bi xwendina xwe ya efsûnî kirin. Bi hukm û hêza xwendinê ve, di nîvê odayê de, ser û laşê Şahmeranê xuya bû. Bi dileke şikestî li Camîsabî nihêrî. Gote wî:

– Min diviya çu baweriyek bi ademîzad ne haniya. Lê tiştê ku qewimiye, êdî venagere. Ji lewra, min daxwaziyeka herî dawiyê ji we heye û ev e: Ji xwîna min, piyaleya pêşîn bidine Padîşahî, ya duwemîn bidine wezîrî û ya sê-yemîn jî bila ji Camîsabî re be.

Padîşah bi vexwarina piyaleya pêşîn a ji xwîna Şahmeranê, di cih de mir. Wezîr jîr bû û laşê Camîsabî jî bûbû weke berê dîsan. Xal ji ser laşê wî çûbûn, ne ma bûn.

Lê belê Şahmeran hêj ne miribû. Ji lew re ew berî mirina xwe bûbû xwedî keçek. Piştî mirina wê bi sê rojan, dê keça Şahmeranê di çardeh-saliya xwe debihata dunyayê.

Mar dîsan xwedî şahbanûya xwe û li ciyekî din, ji çavê ademîzadan dûrtir, li binê erdekî din, bi aştî û azadiyê bi hev re dijiyan.

Çiroka me li diyaran, dilovanîya Xwedê li miriyên guhdaran û xwelî li serê Bekoewanêni li ber dîwaran.

DΛWÎ

Di nav gelî de, dibêjîn ku "Şahmeran xortekî çeleng û aza bû. Wî serî li hevberî padışahê dewranê rakiribû. Padışahê xwînrij, gel ji ber stema xwe perîşan kiribû. Lê vî xortû, li ber vê bêdadiyê, hez ji serîgemandinê ne kiribû û serî hildabû.

Hevalên wî, li berxwedanê ne durust bûne, ji lew re doza wî jî bi ser ne ketiye. Ji ber vê hindê, wî li ber padışahî, xwe bi şûn de kişandiye û ketiye bin erdê. Bi salan, weke maran, di kun û şkeftan de maye, nîvê laşê wî bûye mar. Vêca maran xwe pê re kirine heval û ew bûye padışahê wan (şahmaran / anku; şahê maran). Paşê miriye û keça wî ya démar, bûye şahbanûya maran. Lê navê şahmeranê her ji keça wî re maye."

Li ser çîroka şahmeranê, bi awayekî din jî tête çîlkin, ku "pişli dakteına peyamber Ademi ser ruyê erdê, di navbera ademîzad û maran de, dijminahi peyda bûye. Mar bûne sedem, ku Adem ji buhuştê hatiye derxîstîn. Ji wê rojê, mar û mirov bûne dijminen hev. Ji ber ku mirovan mar bi hêsanî kuşline, ew li ser ruyê erdê nc mane. Heger mirov ji maran bipirse, qîma hûn di bin erdê de dijin? Mar dibêjîn; em dixwazin bi mirovan re bi aştiyê bijîn, lê mirov dijminatiya me dikin. Me li ku derê bibinin, dikujin. Roja ku mirov dev ji vê helwêsta xwe berdin, hingê em ê jî derkevine ser ruyê erdê."

Maran xwe ji ber stema mirovan kişandine bin erdê. Heger mirov wan ne tîrsînc, ew bi mirovan venadin. Hingê ew dê jî bin erdê derkevin û bi mirovan re bi aştiyê bijîn."